Dilê min.. bihêle bo min

Roj Mizûrî

Ev çavên te
Evên hêjta nebûne çav
Awiryên wan
Min vedkujin
Pirt pirt diken û
Li ber çavê rojê
Bi ristekê ve
Min radiêxin
Qeşavîdibim..
Ma te dil nîne
Ey dilbera dilan dibey û
Dilê te hêj nebûye dil..?

Min bi hemû ve li gel xwe bibe
Bihêle li gel te bijîm
Bixom..
Vexom..
Yan jî dilê min
Bihêle bo min
Belkî ez û ew wek sofiyan
Di nawiskan ve
Bi cezbe biçîn..
Biçîn..
Biçîn…